

# ÊTÎMOLOJÎ – WEK ÊTÎMOLOJÎ!

(Hinek têtînî li ser r'avekirinên êtîmolojî di zimanê k'urdî da)

## Ezîz ê Cewo

Ev demeke dirêj e, di întêrnêta da gotarên di derbarê ziman û r'êzimana k'urdî da tên weşandin. Helbet, gelek gotarên balk'êş û hêja hene, lêbelê hinek gotar jî hene, û di nava wan da, wisa jî yên di derbarê êtîmolojîya k'urdî da, yên ku dibin sedema matmabûnê û pirsan... Û heya hewlên vî r'engî ji bo sazkirina wikiferhenga k'urdî ya êtîmolojî jî hatine dayîn.

Lê, dîsa jî, çî dibe, bila bibe, ger mirov bixwaze û bikaribe, dê ji hêla dîtina p'eyvan û ew xistina nava çerxa lêger'înê va ji van hemûyan sûdekê jî wergire. Lêbes,...

Lêbes, tiştê matmabûnê û ya ku bala mirov dik'işîne, ew e, ku hinek lêger'înerên k'urdî jî wek wan bîyanîyan, ên ku di warê zimanê k'urdî da lêger'în pêk anîne û tînin, hema ku di kurdî da p'eyv, şêwaz an sazîyeke (*structure*) r'êzimanî dibînin, destxweda ewê hemberî ên wan zimanan dikin, ên ku ew bi xwe dizanin, an jî hinek agahîyên wan ji wan hene. Û evan mirovna her carê jî jêder û bingehên p'eyvên k'urdî di zimananên dinê da ger'yane û "dîtine" û p'eyvên k'urdî bi wan şirovekirine ..., ji ber ku wana wisa zanibûne, an jî wisa ji wana hatye xwastin...

Û hinek lêger'înerên k'urdî jî bi întêr'siyayekê weke wana bîyanîyan li k'urdî dînihêr'in û t'evdiger'in... Û even me jî carna heya k'urdî bi t'irkî jî şirove dikin (dapîrên me dê pêsîra xwe dawşandana û bigotana: "Xwedê, bê-bê k'ubarî be, mirov jî zimanê xwe bi wî zimanî, yê ku duh na pêr, kesek nizane, çawa bi sunî çêkirine, şirove bike!?" )

Û, eger ev bi vî awayî bidome, dê r'ojekê vî zimanî (yê k'urdî), yê ku bi k'an û xwezîneya xwe ya p'eyv û bêje û biwêjan va zimanên gelên der-dorên xwe dewlemend kirine, bikin dûvika van zimanan...

Û gotara Husein Muhammed a "Etîmolojîya 4 bajarên Kurdistanê" (dibe ku xwastyê bibêje: "Etîmolojîya navên çar bajarên K'urdistanê?"), a ku li ser pêr'ên întêrnêta gihîştê xwendevanan, evê metirsîyê mezintir dike (<https://zimannas.wordpress.com/2016/08/04/etimolojîya-4-bajaren-kurdistanê/>).

Û, wek ku tê xuyan, nivîsên vî r'engî dê hê jî hebin ...

Helbet, eger mirov ji hêla êtîmolojîya gelêrî va pirsê binihêr'e, dibe ku ji bo hinek xwendevanên ne pispore zimanzanîyê balk'êş be, lê eger bi zanistî, anegorî prênîsip û qanûnên zimanzanîyê be, mirov divê wsa hêsan û lezobezo gotinan navêje hole, divê di vî warî da hê lêger'înen k'ur û girîng bèn pêkanîn...

Êtîmolojî ne k'arekî wisa sade û hêsan e, ku mirov bikaribe r'abe, ji xwe r'a wisa bi destekî sivik, bê zanînen t'aybet ên zimanzanîyê, bê amedek'arî, bêyî bik'aranîna ç'avkanîyên pêwîst, di warê zimanekî da analizên êtîmolojî pêk bîne. Lewra jî ezê li vira hinek têtînîyên xwe bi giştî li ser êtîmolojîyê, û bi t'aybet jî, li ser wan p'eyvan bînim zimên, ên ku, bi dîtina min, ji bo wan ez îro amade me...

Weha, pirsê navê bajarê Cizîrê.

Belê, di nav me k'urdan da, bi t'aybet jî di nav wan da, yên ku p'erwerdeya wan bi erebî ye, yan jî li cîyekî pêwendîya wana bi erebî r'a çê bûye, nêr'îneke çewt û ne heşmendî çê bûye, ku navê Cizîrê ji p'eyva erebî ya cezîre (جَزِيرَة – *ceziratun*) tê der, û hinek jî, ji bo, xwedêgiravî, "giringîyekê" bidin vî navî, wî wek Cîzre bilêv dikin... Helbet ev diyardeyeke xwezayî ye, ev komplêk'sa xwe û hemû nîrxên xwe yên net'ewî biç'ûkdîtinê û bi nîrxên serdest, dagerker û k'oledaran xwe mezinkirinê ye di nav nûnerên gelên blindest da ...

Û di vê r'ewşê da (dîsa bi xwezayî!) kesekî ji xwe nepirsye, ma ev navê k'urdî çi p'ewendîya xwe bi wê p'eyva erebî r'a heye, ya ku tê wat'eya *girav*. Cizîra Botan li k'u, derya û girav li k'u?! Ma gelo di Cizîrê da, an li dorhêlên wê derya heye? Ma ev *çiqasî heşmendî ye?* Gelo hinek bi *şêwazên wan* p'eyvan naxapin, an xwe naxapînin, ji ber ku wisa hêsan e, an...?

Helbet, ev hemû dê *paşê bê wat'* edarkirin, lê em naha binihêr'in, k'a di vê derbarê da çi agahî di ç'avkanîyên dinê da hene.

Ji ber ku Huseîn Muhammed navê Geverê bi p'eyva ermenî ya *gavar'* (գավար) r'avedike (di derbarê vê p'eyvê da emê li jêrê hê biaxivin!), min berê xwe da ç'avkanîyên ermenî.

Çima?

Lewra ku ermenî zimanek e, yê ku di demên dîrokî yên cuda da derdorê 1500 p'eyvên îranî wergirtine, û, ji ber ku ew p'eyvana bi eslê xwe va ne ermenî bûne, ji bo wê jî ew wek ku hebûne, wisa jî "konsêrve" bûne û mane, qanûnên hindur'în ên wî zimanî li ser wana bandor nekirine. Ewana wek ku hatine wergirtin, bê guhartin (an jî bi guhar'tinên p'ir' biç'k), bi heman *şêwazî* jî hatine p'arastin. Û zimanzanên ermenî bi xwe ev dîtine û li ser wê di goveka zimanên hindewropî û hindîranî da lêger'inên k'ûr û berfîreh pêkanîne...

Weha, bavê zimanzanîya ermenîyan û zimanzanekî ku di cîhana zimanzanîyê da tê naskirin, Hraçya Aç'ar'yan di vê derbarê da di "Ferhenga êtîmolêgî ya binaxeyên zimanê ermenî" da, di bin sernivîsa "Alîk'arîya ku ermenî daye farsî" da çi dinivîse: "*Her iranîzanek, ê ku p'ir'i-hindikî` bi ermenî va mijûl bûye, bala p'ir'anîya wan çûye ser wan p'eyvan, ên ku ermenî di demên cuda da ji zimanê îranî wergirtine, ji farsîya kevn, p'ehlewî û farsî. Anegorî hejmartina min, – Aç'ar'yan gotina xwe didomîne, – hejmara p'eyvên ji van hemûyan wergirtî digihîje 1405-an*". – Û ev jî evî zimanzanê navdar derdorê sed salî berê nivîsye! Û, wek ku Aç'ar'yan bi xwe dinivîse, ewî ew p'eyv, ên ku ji farsîya nû derbazî nava ermenî bûne û îro di zaravên gelêrî da hene, nekirine nava navnîşa wan p'eyvan. (Berga çarem, r'ûpelê 663).

Û ji bo ku bê têngihîştin, k'a ev 1405 peyv tê çi wat'eyê, divê mirov bizanibe, ku ev hemû p'eyvên bingeyî in, û ji van û li ser bingeha van di nava sedsalan da bi hezaran p'eyvên ermenî yên nû, yên têk'el hatine saz kirin... Û ji ber wê jî, wek ku Aç'aryan bi xwe dinivîse, di nava zimanzanîya giştî da demekê ermenî wek yek ji zimanên îranî hatye naskirin.

Lewra jî eger mirovek bixwaze, yan jî hewl bide, p'eyveke k'urdî anegorî p'eyveke ermenî bike, divê di sêrî da hînbibe, k'a ew p'eyv, a ku di ermenî da heye, çiqasî ermenî ye, an jî çiqasî ne kurdî-îranî ye, *paşê nêr'inekê* bîne zimên...

Û, anegorî vê jî, dema peyvên zimanê k'urdî hemberî yên zimanên dinê jî dikin, divê bi heman prînsîpê t'evbiger'in...

Û ev yeka ji bo zimanê erebî jî pêkan e, lewra ku di serdema îslamê da, gelek filosof, ezdazan (*teolog*), dîrokzan, nivîsk'ar-helbestvanên ereb, wisa jî siyasetmeder, mîr û hakim û serleşkerên wan bi net'ewa xwe va k'urd bûne, û her yekî ji wan di dema xwe da p'arç'eyekî ziman, çand, wêje, r'uh û r'ewana k'urdî anye nava ereban û zimanê erebî...

Naha em vege'rin ser navê Cizîrê – Cizîra Botan, cîgeha mîr û serdarên k'urdan, warê gulvedana felsefê, wêje û zanista k'urdî!

Û, wek ku li jorê jî hate gotin, ev navê k'urdî t'u pêwendîya xwe bi wê p'eyva erebî r'a nîne, ya ku tê wat'eya *girav*...

Ereb duh na pêr li ser van axan p'eyda bûne, lê navê Cizîrê, dibe ku diçe, digihîje k'urahîya hezarsalan, û divê r'ehên vî navî di zimanên îranî û yên hindewropî yên kevnar da biger'in...

Ji bo ku vê r'avebikin, em biniêr'in k'a p'eyvên îranî (mabest ne t'enê zimanê farsî ye!) di erebî da çawa hatine guhar'tin. Weha, p'eyva 't'ag' a îranîya kevnar derbazî nava erebî bûye û li wira bûye 't'ac', û **paşê ev** p'eyva îranî êdî bi **şêwazê** 't'ac' vegeer'yaye nava farsî û k'urdî. (di heman ferhengê da, berga 2, r'ûpelê 135). Heman çarenûs hatye sere p'eyva 'burg' a hindewropîya kevnar jî. Ev p'eyv bi r'êya zimanê asorî derbazî nav erebî bûye, li wir bûye 'bûrc' û peyr'a bi vî **şêwazî** vegeer'yaye nava zimanên îranî – 'bûrc', di k'urdî da bûye 'birc' (*birca belek!*).

... Û, dema mirov ji vê hêlê va li r'avekirina p'eyva Cizîr dinihêr'e, **ev tê heşê** mirov: "*Lê, eger şêwazê vê p'eyvê ye destpêkî Gizîr an şêwazekî mîna vê bûye, yê ku paşê di bin bandora erebî da, an bi pêvajoya dengguhêr'îyê bûye Cizîr?*"

Ji bo vê em dîsa ferhenga Aç'ar'yan binihêr'in.

Di ermenî da jî p'eyva bi **şêwazê** 'gizîr' heye (bi ermenî - գիզիր), û Aç'ar'yan wê p'eyvê weha şirove dike: "Gzîr – 'k'amir', 'zil', 'şivik', ên ku bi wan zembîl an qesîl tên hûnandin. Wsa jî hemberî p'eyvên silavîya kevn – 'Zîzlû' (jîzl), ya r'ûsî – 'Zezlû' (jêzl), ya çekî – 'Zezl' (jêzl) – *kevezan, ç'ov (ç'o)* bikin... di sûmerî da – 'gizi' – *k'amir/leven/qamîş*, a ku gulvedide" (di heman cîyî da, berga 1., r'ûpelê 548).

A, bala xwe bidinê: *k'amir, zil, şivik, kevezan, ç'ov; k'amir/leven/qamîş*, a ku gulvedide!

Ya ku îro divê em bala xwe bidinê ev e: an Cizîr deverek bûye, li k'u *k'amir, zil (qamîş)* gihîştine, an cîhê şeh û p'adşahan û mîran bûye – bi xwe *kevezan/ç'ov (ç'o)* nîşan û sembola desthilatdarîya mîrtî û p'adişahîyê bûye...

Û ji bilî vê: lê, eger k'urdan di demên kevnar da ew *k'amir, zil (qamîş)* wek hêmaneke nivîsarê – pênuş, pêkanîbin?

Ji van peyvên her yek jî li navê Cizîrê tê, ji bilî *giravê* (جزيرة)!

Ji bo ku em di bersivên van da bi bawer bibin, divê careke dine dîroka Cizîra Botan (warê gulvedana wêje, zaniest û felsefeyê, cîyê mîr û desthilatdaran) û erdnîgarîya wê ya kevn vek'olînin...

Û, eger hinek r'wşenbîrên me yên pisporên dîrok û erdnîgarîya K'urdistanê di vî warî da ji me r'a bibin alîk'ar, hinek agahî bidin me, û bi wê k'eda xwe bikin nav vî k'arê girîng, emê spasdarê wan bin!

Nha jî pirsê navê Geverê!

Di destpêkê da, em careke dinê binihêr'in, k'a Husein Muhammed evê çawa şirove dike «*"Gever" yan "Gewer" ji ermenî ketiye. Eslê peyvê maneya "herêm, navçe" yan jî "eşîr, binemal" û warê wan dide û ji zimanekî Kafkasyayê hatiye. Bidin ber gurecî "gvari" (binemal, eşîr, nijad). Heman peyv bi şiklê "dever" jî di kurdî de li kar e*».

Lê naha jî – k'a Aç'ar'yan çi dîtina xwe li ser vê heye: "*Gavar (erm. - գավար) – herêm an beşekî herêmê. Ev p'eyv ji zimanên kafkasî an xaldî hatye wergirtin. Hemberî p'eyva gurecî ya 'gvari' bike, angû, 'şêwaz', 'berek' (eşîr, zayend, malbet); 'gvarîanî' – 'başnijad', 'esilzade', 'bijarte'*".

Û li vira jî, eger mirov li evê mijarê ne bi **şêwazî** (formal) binihêr'e, dê bi vê pirsê r'a r'ûber'û bibe: "*Ma herêm an beşekî herêmê çi p'ewendîya xwe bi 'şêwaz', 'berek' (eşîr, zayend, malbet) û 'başnijad', 'esilzade', 'bijarte' heye?*"

Li ber ç'avan e, ku li vira hîç tiştek jî li hev nagire!

Û ya balkêş jî ew e, ku her çiqas tê zanîn, ku ewqas p'eyv ji *farsîya kevnar, p'ehlewî û farsîya* nû hatine nav ermenî (derdorê 1500-î!), û ev zimanan jî, yên ku Aç'ar'yan behsa wan dike, li ser bingeha medî (=k'urdî) wek ziman **şêwaz** girtine, lê, yek e, dîsa li

şûna di nav zimanên hindewropî û hindîranî yê kevn û nû da biger'in, berê xwe dane derdorên dinê – kafkasî û nizanîm çî!

Jixwe nêrî'na li ser p'êwendiyên bi gurcî r'a nikare xwe li ber pirsan r'anagire, lê eger em bê ser zimanê xaldî, wê demê divê r'astedêr di nav k'urdî da biger'in, lewra ku civaka xaldîyan yek ji wan bûye, yê ku beşdarî çêbûna êt'nogênêza k'urdên îroyîn bûne û îro jî bi wî navê xwe va di nav k'urdan da hene – xaltîyan/xaltan. Û lewra jî divê, dema berê xwe didin kevnemayên xaldîya kevnar (*archaism*), divê wisa jî di nav k'urdî da li wan biger'in. Weha, di k'urdî da p'eyvşêwazên *guhêr' / guwêr' û ger' heye* (bi wat'eya aqareke ne zêde berfireh di navbera ç'îyan da an jî li berp'ala ç'îyayekî, heta li cîyekî bilindcî li milê ç'îyan!). Û ev p'eyvana jî hem bi wat'eyî, hem bi şêwazî bêhtir nêzîkî p'eyv û navê Geverê ne, ne ku ew hemû şêwazên ku di hinek cîyan da li ser wan dinivîsin û Huseim Mhemed jî hinekan jî wana jî bo t'êza xwe bi k'ar tîne.

... Û li ser pirsana navê Yûksakovayê, ya ku ew biradera dîsa bi t'irkî şirove dike! Bi dîtina min, dê r'asttir bibûya, eger mirov bersîva vê jî di k'urdî da biger'ya ... Dibe ku demekê navê vê deverê an ê cîyekî wê Bilindava, Bilindcî, an tiştêkî mîna van bûye û k'urdekî xulamokê dewleta t'irk jî ji xwe r'a hildye û ew weke xwe wegerandye t'irkî...

Helbet herdu navên dinê jî (yên Colemêrg û Şirnexê) p'êdivîya xwe bi lêger'inên zanistî yê k'ûr û girîng hene, û divê r'ehên wan jî di zimanê k'urdî da biger'in, ne ku berê xwe bidin deverne dinê û tiştne dûrî heş û aqilan bibînin û bi destê zorê li stûyê zimanê k'urdî balînin...

## Li şûna peynivîsê

Belê!..

Tiştêkî balk'êş e, mirov çî kesekî jî çî çivakê û gelî jî hilde, ew zimanzan be, an amator, dema p'eyveke zimanekî bîyanî r'avebîke, ewê bi p'eyvên zimanê xwe şirove dike. Û ev, her çiqas ne zanistî ye jî, lê xwezayî ye, ji ber ku ewî bi zimanê dê ç'avên xwe li wê cîhanê vekirye, ew nas kirye û bi xwe jî wek kes gihîştî. Û lewra jî ew di bin pîrîzmaya zimanê xwe da li cîhanê dinihêr'e, wê têdigihîje û r'avedike.

Helbet, ev ji hêla zanistî va ne r'ast e, lê ji hêla xwehîskirin û xwetêgihîştina net'ewî va, wek helwestekê, balk'êş û girîng e...

Belê, şirove divê li ser bîngêha zimanzanîya zanistî pêk bên! Lê wek helwest... mirov jî mirovên weha r'a çî dikare bibêje – mirov in, serbest in... Lê, dema digihîje asta pisporîyê, ev êdî nayê têgihîştin...

Helbet çiqas ev ne r'ast e, ewqas jî ew ne r'ast e, dema yek her tiştê zimanê xwe bi zimanên bîyanî şirove dike û her tiştê zimanê xwe dibê, digihîne wan zimanan...

Wek ku li jorê jî hate gotin, her nivîseke Husein Muhammed a di warê êtîmolojîya k'urdî da (ji wikiferhengê heya van gotarên wî) t'enê mirov matma dike, û mirov jî, bêyî r'ayê xwe dixwaze bizanibe, k'a, gelo ev ji k'u tê?

Û dema ku min hewl dida, ku evê tê bigihîjim, hinek bûyerên demên bihurî hatin bîra min.

...Destpêka salên hevtêyî yê sedsala bihurî bûn. Wê demê em hê xwendk'ar bûn û carna diçûn nav k'urdên gundên derdorê Yrêvanê, zargotina gelêrî û nimûneyên zimên ji zarê wan dinivîsîn-berev dikirin, ji bo lêgerînan... Di gundekî da kalemêrîkî k'urd hebû – camêrekî zane, zarxweş û sowbethez...

...Ewî gelek p'eyvên bîyanî bi k'urdî şirove dikirin. Mînak, ewî digot, ku p'eyva

*Kilikya* ji k'urdî tê, ango, “*k’î li k’îya*”...

... Dîsa hema wan deman di nava ermenîyan da jî yê mîna vî kalemêrê k'urd hebûn, ên ku gelek p'eyvên bîyanî bi ermenî şirove dikirin. Mînak: digotin peyva *mûştari* (մուշտարի), yê ku di ermenîya gelêrî da bi wat'eya 'k'ir'yar' dihat bik'aranîn, ji gotina ermenî “*T'im were!*” – bi ermenî: “*Mîşt arî*” (Միշտ աւրի.) tê...

Lê, wek ku tê zanîn, *Kilikîya* di demên kevnar da navê herêma başûr-r'ojhilatê Asîya Biç'ûk bûye, û ew nav bi xwe jî p'eyveke yewnanîya kevnar e: *Κιλικία*, bi latîni – *Cilicia*, û tu p'êwendîya xwe bi k'urdî r'a nîne... Û p'eyva '*mûştari*' (bi ermenî: մուշտարի) jî, ya ku ji t'irkî (*müşteri*) derbazî nava ermenî bûye û di hinek zaravên gelêrî da tê bik'aranîn, tê wat'eya 'k'ir'yar', t'u p'êwendîya xwe ne bi t'irkî û ne jî bi ermenî r'a nîne, ew di bingeha xwe da p'eyva erebî ya '*meşteri*' (مشتری) heye...

Di zimanzanîya zanistî da ji şiroveyên vî r'engî r'a *êtîmolojîya gelêrî* tê gotin...

Lêbelê, di r'astîya xwe da jî, *êtîmolojîya zanistî* û ya gelêrî weke erd û asîman ji hev dûr in.

Gelawêja 2016-an

Pyatîgors/R'ûsya